
# Mehmûdê Eko



# Çend Çirûsk

*Pengek ji kurte çîrokan*

*Mehmûdê Eko*

# *ÇEND ÇIRÛSK*

*Pengek kurteçîrok.*

Ji bo pêwendî yê û daxwazkirina pirtûkan, dikarin li ser vê navnîşanê ji mere bişînin:
A. Hasenjäger, Lutherstr. 35, D-30171 Hannover
Bi Almanî jî hin ji kurte çîrokan hene.

*Mehmûdê Eko: Çend Çirûsk,*
*Almanya 1999*

*Wêne ya qabê:*
*Hunermend Birahîmê Eko.*
*Wêne yên hundir:*
*Hunermend Seûd Ahmed û hunermenda elman Kunî.*
*Rêzkirin: M. Eko.*
*Serrastkirina rêzimanî û lêveger:*
*Rojnamevan û nivîskar Silêman Alî.*
*Deranîn:*
*Agniz Hazin Yêger*

*Hemî maf ji nivîskar re parastîne.*
*1500,*
*çapa yekem, adar 1999.*

*Diyarî*

*Mamosta Behzad! Ez dizanim, canê te di gorê de jî venahewe û natebite. Diyarî wan rojên xweş gava te ez fêrî vê nasnameya bedew dikirim û gavên min di meydana Kurdiyatî yê de serrast dikirin. Diyarî bêcirî û serhişkîya te. Mamosta! Herdem wiha bi serê me tê, mirin her tiştê xweş ji nav destên me direvîne. Diyarî canê Roza te, ku xwe kirîye fenerek ji herdu çîçekên we, Berzanî û Bêrîvanê re.*
*Diyarî ew kesên, ku şiyar diman heya berbangê, da em karibin bi xweşî razên: dê, bav û bi taybetî xweha min Sûadê ya ku ez xwedî kirim .*

*Diyarî Agniz Hazin Yêger, ku hişt ev pirtûk ruhnî yê bibîne.*

*01-03-1999, Mehmûdê Eko, Almanya.*



# *Naverok*

*Ez jî rojekê ewîndar bûm.5..................13*

*Goristan.14..........................................27*

*Kîjan ez bûm.28.................................39*

*Çend Çirûsk.40....................................43*

*Dema hebûn hat.44............................51*

*Ez ji te hezdikim.52............................55*

*Erê gelokê.56.......................................59*

*Carekê çû û nema hat.60....................63*

*Serşoka gunehan.64...........................66*

## *EZ JÎ ROJEKÊ EVÎNDAR BÛM*

*Xuşîna daran pirr bi guhên min xweş dihat. Dem payîz bû, dilopên baranê dîmenê guroveriya gola avê qulqulkî dikirin. Ez bi wê dîmenê pirr kêfxweş dibûm, nexasim dema ku dilopin jê bi ser pozê min de dişemitîn. Hino hino ba bi hêz dibû, lbên baranê girtir dibûn, xurexura baranê ji canê min re dibû mîna kêfxweşiyeke nediyar. Ez jî mîna wan çûkên xwe dabûn ber sitara, di bin çuqlîkî de yan jî di bin perrê daran de, xwe ji baran û şiliyê diparastin, tevî ku payîzê tu şînî bi daran ve nehiştibû.*

*Dengê bê bi sistayî xwe ji guhê min qut dikir û baranê dilopên xwe kêm dikirin. Rojê bi payebûn sîtavên xwe dikirin diyarî û dengê çûk û çivîkan li wê daristanê dibû mîna sînfoniyekê. Her dever di evîna wê kurtedemê de dijiya. Bi wê sistayê re dar û sipîndar û hertiştê*

*heyî ji jiyanê re dibûn qurban. Xelekên ewran li dor hev diciviyan û bi nazî sirûdên paşerojê distiran. Rojê jî her û her em tevde bi nazikiya xwe pîroz dikirin. Ji nişka ve dengekî rewan ez bi gotina xwe sist dikirim. Guhên min bawer nedikirin, ku ew deng dengê wê ye:*

*- Tê ta bigre, were laşê xwe zuha bike.*

*Ez şaş û gêj dibûm, gelo ewe yan na...!? Di nav van pirs û bersivan de ew digihişt ber min. Bi zîvirandina xwe re, ku ez çi bibînim: dêmên gulgulî mîna du sêvên sor, sînga bel û fireh. Dilê min bihêz dikire kurpekurp û mejiyê min di cih de ji min re digot:*

*- Erê, ewe.*

*Wê destmalkek ber bi min ve dianî, dibeşişî û digot:*

*- Zaroktî nema bi te dikeve, yên weke te zarokên wan hene..!*

*Min di nava xwe de dixwest, ku hîn û hîn axavtina wê berdewam bibe, lê mixabin ew herdem bi kurtî diaxivî. Min dixwest, ku baran raneweste, lê mixabin baranê jî hêviya min dibirrî. Destmalk bi nermî di ser dêmên min re dibir. Carna destên wê dighane destên min, lerz bi min dixist. Wê hîngê min dixwest ez wê himbêz bikim, tevî ku min nizanibû bê ew bi çend salan ji min mezintire. Min hest dikir, ku ez û wê ji demek kevin de hev nasdikin.*

*Bi destê min digirt û maç dikir. Bi maçkirina wê re min tê derdixist, ku hestên min û wê yekin. Bêhemdî destên min dighane sînga wê, hingî lerzek bi laşê min diket. Ew cara yekem bû, ku ez bi xweşiya jiyanê hest dibim. Ji fedya min serê xwe berdida ber xwe û nema dizanî çawa xwe ji vê fedyê derxim. Nizanim, dibe ku ev cara yekem be ew jî wisan hest dike. Min bi awirên xwe nerîneke*

*kurt û tirsok jê didizî bê çawa lêvên xwe gez dike. Di hinavên xwe de ez dibûm mîna pizotekî êgir û mijandina lêvên wê ji min re dibû hêviyeke bi saw..!*

*Ew lêvên sorî erxewanî, te yê bigota xwdê ji xwe re neqişandine. Wê kurtedema bêdeng gelek tişt di nava min û wê de dizandin. Ew bêdengî di dilê min de xweş dimeya, nexasim dema ku destê min di destê wê de û em hêdî hêdî birêdiketin. Wê demê ez dighame bawerîyekê, ku ew jî di hinavên xwe de mîna min dikele. Li nîvê rê ez dame rawestandin û bi dilzarî ji min re got:*

- *Te çi bela xwe firotiye min? Ez bi gelekî ji te mezintirim! Heger min mêr bikira wê anha zarokên min bi qasî te bana..?*

*Hingî weke ku hinek kwîzek av bi ser min dakin, ez di cihê xwe de çurisî dimam û xweziya min di qirika min de dima. Tirsa min ew bû, ku ew wisa ji*

*min re bibêje.! Dibe ku wê jî tiştin dixwestin, lê ji ber vê yekê newêrîbû eşkere bike. Tiştê hate ber devê min ev bû:*

- *Hezkirin, biçûk û mezinan ji hev nas nake.*

*Bi gotina min re dêmên wê divebûn, mîna gulekê ku di bin berfê de be û buhar bi ser de bê. Bêdengî dibû mêvanê çavên me yên ji bendewariyê westyaî. Wê pişta min dida qurmê darekê û bi xezeb xwe bi ser min de diçemand. Herdu lêvên me mîna du libên şekirî di nav ava jiyanê de diheliyan. Nizanim çawa çêbû, min ew himbêz dikir û me xweşiya xweristî dida hev.*

*Evîna me, agirê di nava me de, nêrtî û mêtîya me, em di buhuşta xweşiyê de radimedandin. Hemû tiştan di wê daristanê de bêhna me werdigirtin. Bi nazî digot û kenê bêhemdî li ser lêvên wê dibû cihê pîrozî yê.*

*- Te ya di dilê xwe de bi cî anî? Niha tê çi bikî, gelo tê bikî bîranînek yan..?*

*- Min di nava xwe de dixwest ku gelek tiştan jê re bibêjm. Min dixwest bibêjim: „Hê jî zû ye, niha neçe", lê di gotinên wê de matmayî dimam! Bêhna xwe diberda mîna miroveki, ku ji palê hatibe, wisan westyaî bû. Dîsan li min dizîvirî û bi fîxan xwiyanî dikir:*

*- Bela ev roj, şahî û ev xweşî bibin nameya destpêka evîneke negihştî. Bila bibin gilokên berfê û di nava me de şûnek bin.*

*Di bin çavan re dinerî û piçekî diponijî, dîsan bi ser gotina xwe ve dikir:*

*- Payîz herdem payîze, tucaran nebûye û nejî dibe buhar! Pelên nazik û rewan ji şaxan didize, tezetî ya pel û şaxan, ku di buhar û havînê de cihê xweşî û hênikbûnê ye bi nazî dighêne ber destê xwe û wan hildiweşîne ser kenarên kolan û kuçan, ji jiyanê vedqetîne.*

*Ez di axavtina wê de pirr mijûl dibûm, nizanim çima wisan digote min, gelo çê li xwe dikir, yan çê li rojên ku tên dikir. Me xatir ji hev dixwest, her yek ji me bi aliyekî ve diçû, bêyî ku em ji hevre bibêjin, çilo, yan çawa, yan li kîjan deverê emê dîsan hev bibînin.*

*Demek dirêj dikete wê navê, rojekê ez ber bi daristanê ve çûm, lê mixabin min tu kes nedît, çiqasî mam, lê kesî ji min nepirsî û negot:*

- *Kuro! Ma tu li benda çi rawestyayî mayîye?*

*Her roj ew ma karê minî ji sibê tanî bi êvarê. Ez bibûm nerînvanê paşerojeke nediyar. Her gotinek wê ji min re bibû destanek. Ew hestên ku em gihandin hevdû bibûn pîroziyek di nava min de, bibûn sibeheke sar û seqem ji evîneke negihiştî re, wekû wê got. Nizanim bi kude çû? Gelo ji xwe re mêrek kir, yan jî ji vî warî barkir..?*

*Mixabin dosta min nehat û nehat. Ew daristan dibû cihê zayîna wê evîna biçûk, ku negiha zanê û beravêtî bû. Payîza wê bibû damarên min, ew çû, lê ez li şûn xwe hebûnek payîzî di dilê buhareke geş de hiştim. Bê hêvî, bê soz di pêxila jibîrkirinê de hiştim, weke keweki bi tenê di dava mirovên xwe keve, bê çare li ser xwe sirûdan biafirîne û ji xwe re temenê xwe bilorîne.*

*Gelek caran bîranîn dibin xwekujê xwe ji bo jiyan di bîranînan de bijî. M. Eko*



# *GORISTAN*

*Ji bo Rûyarê Amedî û Ebdilhefîz.*

*Dem payîze, icacok li riyan zîz dikin. Roj li nîvrojê ye, dijware bi tîrêjin tebaxî. Ji dûr ve rewrewk mîna deryan pêlan vedide. Dar û sipîndar pelan diweşînin ser kêlekên riya, mîna berrekê di wê navê de hatibûn raxistin. Weke gemiyan vizeviz bi çuqlî yên daran diket. Di deştek fireh û dirêj de çend Keleh û Kavlên, ku ji demek dûr ve xopanbûyî, diyar bûn. Di kêleka keleheke mezin de, nîvgotistanek ji min re xwiyanî dikir.*

*Ez ber bi goristanê ve çûm, kurtedemekê rawestîm, raman pirr kûr û fireh dibû û pirs dihatin mejî bê kelem û nabûn. Nêzîkî kêlên nîvco dibûm. Yeka şikestî ji wan awir dikşandin ser xwe. Ew kêla mezin tiştê ku jê mabû mîna latek biçûk*

*bû, û yê mayî ji kêlê tu kes nizane bê kanî, yan jî kê veşartîye. Bêhtir nêzîkî wê dibûm, û min temaşe dikir bê ka çi li ser nivîsîne. Çend gotin jê hatibûn qetandin, yên mayîn bi tîpin hûr li ser kolayîbûn: „piştê zû bi zû veneke, ciwanyê ji dest xwe bernede". Piştî çend xalan gotinin dîtir hebûn: „Bext ..Reş ..Dem Çûye..Li..*
*Çend tîpên kurtkirî jî hebûn, K..O..D..B..A..?*

*Li ser goreke dîtir nivîsîbûn: „Milet mêra çêdikin , ne mêr miletan çêdikin".*

*Serê min wisan di wan ramanan de gêj dibû. Di wê sawê de piçekî paş de divegeriyam. Ji nişka ve dengek dibû zîzok, li bin guhê wan kelh û kavlan diket, ezman ji ber dihejiya. Ba bi hêztir dibû û ji xwe icacok hew dihat dîtin. Wê kerş û gemara li nav wan dera bi jor dixist, li hev badida û bi dûr dixist, tenê bigota giha ezmanê heftan...*

*Ez di cihê xwe de çurisî dimam. Raman û hêviyên min hildiweşiyan. Ez di cihê xwe de dibûm wekî mîx, dest û çogên min ji ber xwe ve dilerizîn. Dengekî qube dihat guhên min:*

- *Te çi divê lo..?*

*Dev û lêvên min zuha dibûn û dîsa deng dihat:*

- *Ma tu çi vediperixîne kuro?*

*Xwedîyê deng ber bi min ve dihat, kifşek por li serîkî mezin, riheke dirêj, simbêlin badayî li çep û rastî dêman, awirin dijwar mîna birûsk û tavan jê der diçûn. Wisan digot û çawa qad ji bin min vedidizî. Min dixwest bersivê bidêmê, lê mixabin zimanê min dihate girêdan. Berya ku ew bighêje ber min bi çend gavan, min digot belkî ez di bin qadê de dirim. Rengê wî û yê axê diketin nav hev. Saw bi min re çêdibû, çogên min ez dixapandim, lê min bi zor hêz digirt û bersiv dida yê:*

- *Ez Kurdim!*

*Keniya, kenekî bi hêz, keleh ji ber dihejiyan, mûyên serê min ji ber radibûn. Bi dengekî xurt serê xwe pêre dihejand nabûna xwe diyar dikir.*

- *Şerme ku tu dibêjî ez Kurdim!*

*Min xwe nedigirt, ji gumanan sed pirs û bersiv dihatin mejî yê min, min berê xwe dida yê:*

- *Ez Zeredeştî û Mîdî me.*

*Awirin dijwar di min ·vedidan û dîsa digot:*

- *Kurd narevin, zeredeştî paşde venagern, Mîdî ranakevin hey te xwelî li serê min kiro!..*

*Bi gumanek mestir û hêvîyek ji berê bilindtir, min jêre got:*

- *Qet ne şerme, qad dibêje, deşt û çiya dibêjin.*

*Min destê xwe ber bi goristanê ve dibir û bi ser vedikir:*

- *Mam! Goristan dibêje, Keleh û Kêl dibêjin, ezman bi payebûna xwe dibêje, zar û zimanê ku ez û tu pê diaxivin dibêje: „Ez Kurdim".*

*Pirr bîn teng dibû û destên xwe bilind dikirin, weke dêwekî bû, çeplin dirêj û qelew li gewdekî mezin. Bêhna xwe berdida, dibeşişî û bi nazî û dilovanî ji min re digot:*

- *Kurê min Kurdiyatî ne axavtine. Ezê çend tiştan ji te ra bibêjim û wekû civaka kurdan bi şermî û ne şermî bibêje erê yan na. Guhên xwe xweş bide min, ji bilî carekê ji te re nabêjim.*

*Di hinavên xwe de ez tevde dibûm guh, min pirr dixwest ku ew zû bi zû wan gotinan bibêje. Bi razîbûnek mezin û hêvîyek bilind wî berê xwe dida min:*

*-Ma şerme, ku di civaka kurdan de keç bê mêr bimîne?! Ma şerme, ku dara te ya evînîyê ber negre, yan ber bavêje?*

*Her wisan ew dipeyivî, nizanim çima wisan bi min re dihat xwiya kirin, mîna ku min di jiyana xwe tevî de heskirin nekiriye. Tevî ku gotinên wî hêsanbûn, lê bi min gelekî mezin bûn. Di mejiyê min de mîna hevîr tirş cihê xwe mezin dikirin. Wî bi fixan û azar berdewam dikir:*

*- Ma naxwe şerm çilo ye, yan çawa ye? Ma gelo ne şermeke pirr mezine mirov nizanibe bi zimanê xwe bixwîne û binivîse, gêografiya xwe, dîroka xwe, kultûr û kelepora bav û bapîrên xwe nizanibe? Çawa devê te digere û tu dibêjî „Ez Kurdim"? Kurê min! Mirov carekê tenê li ser rûyê zemînê dijî, tucaran û di tu deman de nebûye, ku mirov du caran dijî. Bila wê carê bi serbilindî be.*

*Du rondikan xwe dikirin cot û xwe bi ser wan dêmên weke kendalan de diherikandin, firefir pê diket, hew xwe digirt. Pişta xwe dida min û bi mixabinî digot:*

*- Bêtirs bide dû min, ezê te şanî te bikim!*

*Bi wan gotinên xwe yên mezin weke, ku gwîzanan li laşê min bixe, bi saw ez sergeşte dimam. Di navbera deryê zanîna xwe û ya wî de, di nav rûpelên welatparêziya xwe û ya wî de, behitî dimam û min ji xwe dipirsî: „Gelo ma ev çi Kese?". Lê min tu bersiv nedidît. Nexasim dema ku li min dizîvîrî û serê xwe ji min re dihejand, ez di ramanên wî de nedighiştim.*

*Li me dibû êvar, tîtik û tilûran, çûk û çivîkan bi şahî çîveçîv dikirin, ber bi hêlînên xwe ve difiryan. Tîrêjên rojê ji bin ewran xwe berdidan ser kendal û newalan. Aso ber bi windabûnê ve diçû.*

*Sistiyekê ez digirtim û min ji xwe dipirsî:*

- *Gelo em bi kîjan alî de diçim, rojhilat, rojava, çep yan rast?*

*Newalek dikete ber me de. Xaçirêkeke zirav ji serê xirbekekî dadiketê. Bêhneke pîs û genî mîna bêhna miraran jê difûrî ya. Li ber latin mezin yek darine pîrî kevnar, ji ayên demê, pişt xûz kiribûn. Newaleke kûr tiştek tê de nexwiyabû. Li jorî wê çiyayên bilind bûn, di binyê re gelî û zinarbûn. Hin tebayên bêmirês xwe ji ser xaçirêkê vedidizîn, bi bazdan li pişt xwe jî ne dimeyzandin. Hin ji wan bi zikkişkê û hin bi çarlepan, xwe ji devên qijal û kundan diparastin. Ew ji mişkave li min zîvirî, kenî û got:*
- *Netirse ev newal newala...!!!*

*Min ji xwe re digot, dibe ku ev mirov dixwaze min bitirsîne, lê çima? Yan jî*

*dibe ku ev ji cinan be, dixwaze min birevîne nav miletê xwe! Ez sist dibûm, dêm li min zer û sor dibûn, hem ji tirsa û hem ji fedya tirsê. Tirsa min duqat dibû dema, ku çavên min li hestîyên mirovan diketim. Çend gavan bi pêş de meşîya, li min nerî û beşişî:*

- *Virde were ji xwe re li xwe binere, bê ka çi halê te ye hey Kurdê belengaz, pesindarê şewat û qira xwe!*

*Ez li çi binerim û li çi nenerim, gor li pê gorê hatine rêzkirin, ji hawîr dor ve hatibûn xemilandin, bi hemî rengên hebûnê hatibûn neqiş kirin. Di ber gora yekem de kêleke zêrîn danîbûn. Qevdek ji gul, rihan, binefş û sunbilan danibûn ber. Haletê cot, kum û koloz, dasek û cewdikekî avê jî li ber bûn. Bêhnek pirr xweş jê difûri ya, xemleke, ku çiqas bê gotin wê kêm be. Keziyên reş û zer pêve daliqandibûn. Çend nanên tenûrê li nik wan jî şaşik û cibe, tiving û rextekî ji*

*hev vekirî û tembûr û bilûr jî di binya wan re bûn. Ez ji nerînê têr nedibûm, di cihê xwe de sergeşte dimam!*

*Ez diketim damarên miletekî. Gelo raste, ku ev miletek e..? Ez diketim saweke bê guman û mejîyê min weke, ku zixt lêkevin di pirsê de bû.*

*Gora duwem jî ne kêmî ya pêşî bû, lê ew tev de bi xwîn bû. kilîtek mezin û dareke bêmirês jî li nik wêbûn. Wî serê xwe dihejand û destên xwe bi çavên xwe dixist.*

*Em ber bi ya dî ve diçûn û me didît bê ew çiqasî sipehî bû. Li derdora wê kaniyek biçûk diherikî, masîne rengîn têde digevizîn. Serên marekî û çar bazan li ser kêlê bûn. Çend tilûran xwe li ser kêlê danîbûn û bi fîxan dixwendin. Şal û şapik li nik denekî avê bûn, çi aveke zelal û hênik.*

*Gelek tiştên xweristî li ber gorê hebûn. Ew jî her li ser serhejandina xwe berdewam bû.*

*Gora dîtir nûjen bû, şînkayê nû rehên xwe diberdan ber wê. Kêleke ji zêr di ber de danîbûn. Destekî ji zîv bi pirtûkekê girtibû. Çend wêne û çend pût li dor wê hatibûn rêzkirin. Serê pênûsekê ji komerê hatibû çêkirin.*

*Gora di pê re ji herdû alîyan ve vekirî bû, tijî laşên kevokan bû. Ji xwîna wan min nema zanîbû gelo ev kevok sipîne yan..? Her ku awirên min û wî li hev diketin min bala xwe dida yê ku çavên wî ji girî sor bûne. Wî berê xwe dida min û bi dilovanî û hisret digot:*

- *Ka were em dengê xwe bikin yek. Ku deng bû yek wê li vêderê bibe seyran û sema, wê bibe jîn û hebûn, wê ev gor tevde vebin. Ewqas hestî wê bi goşt û can bibin û wê bibne pêşmerge.*

- *Emê deng bighînin milet, ji bo zanînê, yekîtî û hişyariyê. Bighînin pênûsê, aştiyê. Emê vê newala genî û veşartî bikin buhuştek li ser rûyê zemînê. Soz û peymanên xwe bi cî bînin, kezîzer û çavşînan pîroz bikin.*

*Dema ku wisan dinêrî û digot, sawê ez digirtim, min bi awayekî rewan û ciwan jê re digot:*

- *Ez bi te re me , lê pêşî pirseke min heye eger tu bibexşînî.*

*Çawan xwêdan jê dirijiya û min ji xwe re digot belkî ew li ber çavên min dibe mîna rewrewkê. Wî xwe dida kêleka min, li ezmên dinerî û digot:*

- *Fermo tiştê tu dixwazî pirs bike.*

*Ez di hinavên xwe de hemû bûbûm pirsek, min got:*

- *Tu dikarî ji min re bibêjî tu kîyî, tu çiyî, tu hebûnî yan ez ne li hiş xwe me?*

*Ew keniya û bi tenazî got:*

- *Nûka tê bi çavên serê xwe bibînî, ka ez çime.*

*Me deng dikir yek û me dest dixistin destên hev û me bang dikir: „Kurdo rabe ser xwe". Ew newal ruhnî dibû, pêşmerge radibûn ser xwe, baz difiryan, zanîn hişyar dibû, kilît û dar winda dibûn, kevok difiriyan. Em di wê xweşbûna xweristî de bûn, lê min li kêleka xwe dinerî ku vaye hevalê min bûye mistek ax ji nav destên min tê xwarê.*

*Ez bi ser de daqûl dihatim û min ew maç dikir, ronahî bêhtir jê der diçû. Ji nişkave reqîna tav û birûskan, dengê vizeviza bê dihat û pêre pêre baranê didayê. Xuşîn bi hemû tiştî diket, co û cobar, çem û gol, newal û deşt tije av dibûn. Tu tişt li ser rûyê gerdûnê nedima ji bilî Cûdî. Piştre keskesor dibû padîşahê wê kurtedemê.*

*(Ji efsaneyên rojhilatê, yên şîndar,*
*ez tême ba te.*

*Ji ba „Dewrîşê Evdî“,*
*û ji wê newala şîndar, ku bi xwînê hatiye avdan,*

*Ji Çiyayê „ Sîpanê“*
*Ji dengê „Siyamend“*
*Û dilê min perçekirî ye.)*
*Hamid Bedirxan.*

## *KÎJAN EZ BÛM, YÊ ÇÛ YAN..?*

*Ji bo Elîyê Xalo û Berzan!*

*Bi rawestandina bê re xuşîn ji guhan qut dibû. Ew kurtedem pirr kurt dibû. Yek dilopên baranê ji ser dêmên pel û çuqliyan dişemitîn. Dengê çûk û çivîkan, bêhna daran, rengê qadê, tevan hêlînên bîranînan di nava min de çêdikirin.*

*Rawstandina bêdengiyê di nava min de vekolînek dikir. Ezê li çi temaşe bikim? Min nizanîbû. Gelo li xewnên xwe yên talan bûyî, yan jî li hêvî yên efsane yî.*

*Dengê bêdengiyê tabloyên serjêkirî dianîne sema. Ez jî her di buhara xwe ya çilmisî de, di çavên nêrgizan de, di kulîlkên bejî de diramiyam. Carna tenêbûna min ez dighandim dînbûnê, lê hêrsên jiyanê ez şiyar dikirim.*

*Ji roja, ku ez ji welatê xwe derketime û poşmanî mêhvanê mine. Ez û xewê bûne dijminê hev û dijminatî ya me gihaye bêminetîyê. Weke her miroveki, min jî dixwest razêm, lê mixabin xewê ez dixistim buxçika jibîrkirinê.*

*Ez û keviyên derya bakur (Behr el şemal ), ez û zuxurên dilpola dibûn hevalên hev. Min û pêlan hindek gazin û giliyên xwe bi hev dikirin. Min çavên xwe li hinan digerand da ez tiştne xwe ji wan re bixwînim, lê mixabin min tu kes nedidît, ji bilî pêlan, ku xurexuir û xwişîn bi dora min dixistin.*

*Li nik rawestegehekê rawestim. Mirovek berya min li ser rûniştî bû, serê xwe berdabû ber xwe. Bi rûniştina min re wî xwe hinekî da kêlekê, da ez bi xweşî rûnim. Dema ez rûniştim, min silav dayê, lê silava min bê sûde diçû. Hestên min di cihê xwe de diçilmisîn.*

*Wî mirovî ne li min nerî, ne jî guh da min, lê nizanim çima pirsekê xwe di mejiyê min de belû kir:*

*- Gelo dibe, ku evê li kêleka min rûniştî ye Kurd be?*

*Porê wî reş, dêmê wî esmer û mad wî tal û tirşbû, weke ku hinan jina wî revandibe, lê nizanim çima ez wiha hest dibûm ku kurde. Bi leg... min re, wî jî awirên xwe b... şikenandin, beşişî û ji xwe ... westyaî li min nerî. Û dîsar... pêşî xwe zîvirand. Min dixw... z gotinekê ji nav lêvên wî bibh... î hêviya min dibirrî.*

*Min hinek kulîçe û qutîkeke av... i tûrik derxist. Awirên min çûn... î, ku waye ji xwe re bi min dikem... nî hindek mabû, ku ez sîlakê ... jî pihîneke deynêmê. Min ji x... sî: „Ma gelo min çi kirêtî kiri... i ew wisan bi min dikene".*

*Ez mam behitî. Min di nava xwe de dîsan digot: „Dibe ku tiştek hatibe bîra wî û ji xwe re pê dikene, ne bi min dikene. Ma çî min û wî di nav hev de heye?". Min hêrs da xwe û jê re got:*

*- Fermo bike bixwe, yan jî hinek ava sêva vexwe.*

*Li xwe dananî, ku bi min re bipeyive, wî tenê serê xwe hejand û nabûna xwe ji min re diyar kir. Hîna gepa min di devê min de ye, ez dicûm, ji min re got:*

*- Nûşîcan be birazê!*

*Bi rastî hingî min got: „Ez fetisîm". Gepa min di devê min de mîna girêkek kuîr ma. Zimanê min yê biçûk rawestiya. Hestên min bi dînbûn lerzek dijwar bi laşê min xist. Mejiyê min rawestiya. Pirsê di nava min de şax veda, ev bi çi zimanî bi min re axivî. Heger ez ne şaş bim bi Kurdî bû. Ez di cihê xwe de çurisî mam. Bi dilekî xurt û jixwerazî bi min re peyivî:*

- *Bixwe, nûşîcan be! Bixwe, vexwe û nepirse, kesî tiştek jê nebirye. Ez xweş dizanim bê çima tu hatiyî vir. Tu li hinan digerî, ku tu bi wan re biaxivî, ji wan re tiştekî bixwînî.*

*Hingî min nan û cûtina wî jibîr kir, min daqurtandin ji mejiyê xwe winda kir. Min gepa xwe bi zor daxiste xwar. Hingî xwedê ket bîra min û min got: „Elhemdûlilah". Çavên kesê li nik min zoq di çavên min de bûn.*

- *Te tiştek nexwar. Bixwe, xwarin ji laşê mirovan re pêwêste!*

*Min hew zanîbû, ka ezê çi lê vegerînim. Min zanîbû ku rabûna pêlan û xuişîna avê pirr pê xweş tê . Wî dîsa li min vegerand:*

- *Tiştê ku tu pê dirame ez dizanim bê çiye, ezê rê ya te kin bikim. Tu dixwaze nas bike, ez kîme û ji ku te dinasim. Bera bêhna te hebekî fireh be, ezê tevî ji te re bibêjim.*

*Min xweşik bala xwe dayê, ku tev de limin hatiye: pozê wî, devê wî, çavên wî, dirêjbûn û girsbûna wî, livandina wî, acizbûna wî..mûk ji min berneda ye, wêneyek ji mine. Gelo bira yê mine?! Lê birayên min wekû min tunene. Gelo bavê me yeke, diyên me didone? Ev jî ne raste, ji ber ku bavê min ji diya min pêve jin nanîne. Wî jixwerazî ji min re got:*

- *Ez Revome, ma gelo tu kî yî? Tu karî xwe bi min bidî nasîn?*

*Min devê xwe ji bîr kir, gotin û peyv winda kirin. Min nema bîra tu tiştî bir, ne jî hat bîra min, ku navê min jî Revo ye. Çavên xwe vekirin û bi dilekî tije kîn berê xwe da min weke, ku mirovek dijminê xwe li tehtebejekê bibîne. Min nema zanîbû gelo deng yê mine, yan yê wî ye. Min xwe winda kir. Min dibihîst, ku hin ji mirovan şev li wan digere û rê ya xwe şaş dikin. Lê yê min ne herdûne jî, min xwe winda kir.*

*Di nav bêbaweriya kor de, di gotin û peyvên wî de ez şaş û gêj dibûm:*

- *Bese lo, bese..te ez kuştim, te ez winda kirim!*

*Wisan got û gelekî bêhna xwe li min teng kir, buharên temenê min diqurmiçandin. Bi rastî ez jî pirr bînteng bûm û min berê xwe didayê, min devê xwe vekir û çavên xwe girtin:*

- *Kuro qey tu dînî, yan jî tu xurifîyî? tu kî yî heya tu wisan ji min re dibêjî?*

*Di nava xwe de ez carna pê dikeniyam. Yek carna min têre derdixist, ku ez ewim û ew jî ezim. Carna jî ew ne tu kes bû û ne jî tu tişt bû. Bîna wî pirr teng dibû, dema ku min jê re digot:*

- *Çawa ez û te yekin? Em ne yekin û ne jî dibin weke hev!*

*Çiqasî min bala xwe didayê, ku şêweyên me wekî hevin, lê ez dimam behitî.*

*Dibe ku em herdû yek bin yan em herdû jî tunebin! Lê ne bese, ku em dişibihin hev, ev nabe tiştekî belû: xwedê çil ji hevdû çêkirine. Bi gotinin pirr qelew raserî min dihat:*

*- Tu miroveki windayî ye, lê ez na. Tu miroveki bêarmancî, lê ez na. Tu bê omîd û bê hêvî yî di jînê de, lê ez na. Tu di navbera çar dîwarên odekê de yî di Kampa penaberiyê de, lê ez na. Tu şerê xwe bi tenêbûna xwe re dikî, tu çi yî? Tu ne tiştekî xwiyayî yî! Tu wekî êzingekî li zeviyekê avêtî be, heya ku hin lê rast bên û bi kêr bînin. Wê wextê wê te bi agirê te keî û dax bikin. Tu çi yî? Tu ew tûmikên heshesûkê yên jibîrbûyîne li neqeba Xecokê û Hermê Hesen. Tu ew tirabêlka navbera Hilêlîkê û Til şiîrê ye, ku di bin piyên leşkerên contayên rewrewkî yên bêmirês de hatiye temisandin, hatiye pêlkirin. Di hemî deman de, tu di her tiştî de, winda ye û dixwazî min jî bi xwe re winda bikî.*

- *Lê îro min dizanî bû, ku tê werî vê derê, lewra min xwest te bibînim, da çend gotinan ji te re bibêjim. Guhên xwe xweşik bide min! Divê tu xwe ji devê riya min bide alîyekî berya rojên min xelasbin, da ez bikaribim ji xwe retiştekî bikim.*

*Ez diketim wê bawerîyê û min hest dikir, ku ez dibim mîna kuçekî di beyareke bê omîd de, dîsa jî min bêhna xwe dianî ber xwe û bi nazî jê re digot:*

- *Ka çawa ezê ji te bawer bikim, ku tu Revoyî?*

*Dema min jê re wisan digot, çavên wî sor dibûn û xwe kar dikir ku sîlakê bi min veke. Lê baş bû, ku ew zû ji ya xwe vedgerya, bêhna xwe diberda û mîna xweşîyekê xwe davête ser riwên wî. Min ji xwe re digot, Anha wê bibêje: „Pismam li min bubhurîne, qisûra min nemeyzîne, ez di gotinên xwe de pirr şaş bûm“, lê wî dîsa berê xwe dida min:*


*- Tu siwarê xewnên talanbûyî yî. Tu hêviya niştimaneke beravêtî yî. Tu xwedyê pênûseke jibîrkirî yî. Tu di buxçikên şevan de ye, şevên ji rûreşî ya xwe bazdayî. Te xwe xistiye hûçkên xizêmzêran û wan jî xizêmên xwe ji ber te firotine. Bawer neke, ku mirov di welatê xwe de dibe reben û pepûk, dibe riswa û bazdayî. Bawer neke, ku mirov di welatê xwe de dibe penaber. Tu mîna bêhnên nêrgiz û endeko ye, di deşta Cezîrê de. Tu hêvîya Qamişlo û Tirbesipî yê yî, gumana Amûdê û Serkanîyê yî! Ma ne wisa ye lo? Tu xweziyên wan nefelên serjêrî, ew çîçekên bêavmayî yî! Tu tenêbûna mejiyê ezezîtîyê yî! Te ji kîjan himbêzê bazdayî? Tê li kîjan deryan raweste. Di ramanên te de ye, ku tê bi himbêzên beyaniyê şa bibî û xwe di buhara wê de vegizînî, lê di wê de jî va tu bûye pêkenîkê nezan û qeşmeran. Ma ez hîn û hîn ji tera bibêjim, yan ev besî te ye, da tu bizanibî bê ka çi bi serê te hatiye?*

*- Ez dibînim, ku tu bi ya min bikî tê herî û li xwe bigerî, berkî tu xwe li ser sergoyan yan di qorzîkên kolanan de yan di keviyên deryan de bibînî. Vaye ez dirim û ez ji te hêvî dikim, ku tu zûbizû xwe bibînî.*

*Dema ku ew çend gavan dimeşiya û hinekî bi dûr diket, min ji xwe re digot berkî ez ne li cihê xwe rûniştî bûm. Hîna min xweş awirên xwe nedabûn ser ji ber çavên min diket. Ez di cihê xwe de mîna miroveki di navbera birîna can û ya laş de windabûyî dimam û pirsekê xwe berdida mejiyê min:*

*- Gelo ewê çû ez bûm, yan evê mayî ez im?!! Min jî nema zanîbû bê kîjan ji wan ez bûm.*

*(Ga dimre çerm dimîne,*
*mirov dimre nav dimîne. Ji gotinên Kurdan)*



# *ÇEND ÇIRÛSK*

*Çiqasî birînên min vedibûn , ewqasî ez di agirê dûrbûna te de mijûl dibûm. Dema ku min û te bi destên hêvî û omîdan digirt, dema me daxwazên xwe bi huçkên bêrîvanan ve girêdidan, dema şor û peyvên me belav dibûn û di sînorên bumbekirî re derbasî her çar kenarên gerdûnê dibûn.*

*Min bi awazên tembûra honermendekî di rêkên Xecokê re bazdayî temenê xwe fêrî bendewariyê dikir. Te ez fêrî aramê dikirim. Heger hezkirina ji mirov bê kul û xem ba, wê ne çê ba. Care carna ev nalîn û hisretên di dilan de dibin arama gihştinê.*

*Derdên ku di çepkên xwazgînîyan de asê mane, kulên ku di çavên me de bûne golên ava genî, azarên giriyekî ku şopên xwe di dema me de winda kirine, dema ku me ezman bi awazên evîndariya xwe dixemiland, dema me şaxên arama giyanê bi sirûdên hebûnê dibişkuvandin. Hingî dem istûxwar dibû û dibû kolê yekbûna me, lê mixabin niha demê xwe ji bend û benê me rizgar kiriye.*

*Lê ew yekbûn jî nuha bûye penaberek ji penaberên nebûnê. Çiqasî astengên dilbijyana me xurt dibûn, wisan em li derdora qehfikên tifika bêçariyê dibûn demûşa şevên reş û me ji Yazdanê dilovan dixwest, ku carekê bi tenê gustîlka pêximber Silêman bi destê me bixîne. Lê Yezdan li ser sînorê jibîrkirinê konê meşextiya xwe vekirtibû.*

*Li nik gorek bê kêl min û te hêsir dibarandin. Me daxwazên xwe ji kewan re dikirin bazbend û nivişt, lê mixabin kewan war û hêlîn kiribûn kavil, şalûl û bilbil bi sînorên bêhatinê ve firiyabûn.*

*Heger hat û li warê pinpinîkên xwekuj konê serxweşiya hat vegirtin, dê gul, nisrîn û binefş jibo pozên serxweşa bibin qurban. Heger hat û li tuxbên hechecîkan hêlînên bendewarî yê xerakirin, dê co û cobar ava genî ji golan bidehfînin. Heger ew hat û di ser agirê êtûnê re rawestya û ji nava xwe pif da, dê aleke ji keskesorê rûyê rojê pîroz bike. Heger ew hat û şev ji rojê cuda kir, hingî dê sîtavên zêrîn bibin bêhnên xwedîtiyê. Heger hat û bi navê min banî min kir, hingî dê navê jiyanê û jînê bête guhertin û bibe navê te.*



## *DEMA HEBÛN HAT.....*

*Jibo ye Mihemd Elî.*

*Dar û sipîndaran bi nazî pesnê xemla xwenî bişkivandinê didan. Gul, binefş, nêrgiz û sunbilan bêhna xwe bi şermînî diyarî bêvilan dikirin. Çîçek û indeko serê xwe bi dilşadî ji rojê re diçimandin. ilbil û şalûlan rûyên gulan bi dizî maç dikirin. Qadê kirasê xwenî bûkanîyê bi payebûn li bejna xwe dikir û kemberek sipî li newqa xwenî zirav girêdida. Şivan û kerîyên pez bi dilovanîya zozanan şadibûn. Co û cobaran golên avê di ser re dibirin û çiyan bi serbilindayî pesnê bilindbûna xwe didan.*

*Buhar ji xweristiyê re dibû cihê pîroziyê, hertişt bi rewşa buharê ve dihat girêdan. Ez jî mîna her mirovê jindar bi hemû hestên xwe ve pê re bûm. Dema ku bêhna nêrgiz û nefelan rêkên bêvila min pîroz dikirin, hingî min xwe ji bo vê xweristya çavfireh dikir qurban.*

*Di dema ku bişkojan li ser çuqliyan dest bi rengîniya xwe dikirin, hingî ez bi kêmasî ya xwe heat dibûm. Min dizanî bû ku tiştek ji min kême?*

*Bê erênayê ramanekê xwe di mejiyê min de belû dikir û ez bi tenêbûnê hest dikirim, tevî ku ez ne bi tenê bûm. Ez bi guvaştina dilê xwe re pirr diramiyam û min ji xwe dipirsî: „Ma gelo raste dilê min neqrîskan lê dixe?". Ez di navbera van ramanan de navqetandî dimam!!!*

*Evîneke minî biçûk di dilê yareke ciwan û belengaz de avis dibû. Weke hemî evîndaran me ristên evîna xwe darvedkirin, me omîdeke ciwan ji xwe re avadikir.*

*Ev bû çend sal, bi rastî hew ez dizanim, nema xweş tê bîra min, lê ez dizanim ku dem buhar bû, min û wê kuç bi kuç xanîkê evîna xwe ava dikir, me hêvî û dilovaniyên xwe dispartin sibehin bi soz. Yek carna wê ji min re digot:*

*- Eger tu ji min hez dikî, tê min fêrî jibîrkirinê bikî. Heger baweriya te bi evîna me bê, tê min û dûrbûnê bi hev bide nasîn. Heger bi rastî û ruhnî em bi hev re ne, tê min û gelaciyê ji hev dûr bixî.*

*Şev û rojan pesnê evîna me didan, evîna du dilên perîşan, ku ji dûrbûnê di agirê xwe de diqijilîn. Mixabin ew kurtedem gelekî dirêj nedibû, em herdû ji hev re qedexe dibûn..!*

*Kirasê bejinzirava buharê terîş terîşî dibû. Payizeke bi icacok û tirapêlk bû, dar û sipîndaran xwe ji pelên xwe dadiweşandin. Qedexebûn li himber min û jiyanê radwestiya û digot:*

- *Heger ez te bi te qedexe nekim û te bi agirê te nebrêjim, ma naxwe çima wê navê min Qedexebûn be.*

*Hewar û gaziya min ezman diçirandin. Hêsran şopên xwe di dêmên min de dikolan. Girî di qelpaxên çavên min de dibûn golên ava genî. Dilê minî reben dima temaşevanê bêçareya xwe. Rengê buharê di mejiyê min de jibîr dibû. Bêhna nêrgiz û sunbilan rêkên pozê min jibîr dikirin. Daxwaza min bi mirina zayinê ve, dibû armancek pêwest û min ji xwe dipirsî: „Ma gelo ez di kîjan demê de dijîm..?"*

*Destpêka demê ye yan dawî ya wê ye? Ez Habîlim yan Qabîl im..Ez kîme?*

*Ez hew dizanim ez kîme yan ez çime, mirovim, tebame, hişkim yan nermim..? Min carna hest dikir ku ez valahîme!!!*

*Pirsan di mejiyê min de hevdû dixwarin û yek pirsna xwe kifş dikirin: dem çiye? Kê dem afirandiye? Kê sal û meh çêkirine? Kê roj û şev çêkirine? Kê buhar, payiz, zivistan û havîn kirine pey hev? Çima ne beroçeqî hevin? Kê ez dame vir û gotiye: „Li vira bijî! Tu mirovî li nav mirovan be, tu Tebaye li nav teban be. Jiyan eve, divê tu li vir bijî", kê gotiye?*

*Gelo raste ez heme.? Yan evaya xewneke dûdirêje ji şerovekirinê re?*
*Lê ez bi rastî carna hest dibim, ku ez heme. Jiber ku ez diêşim û gelek caran nizanim çima ez xwe di qalikê xwe de vedşêrim, ez di nava xwe de bi hebûnê pirr hest dibim.*

*Tê bîra min ku evîneke min hebû, lê min nema ji mejiyê xwe bawer dikir. Min nema bawer dikir, ku bîranînên min yên taybetî hene. Hemû tiştên nasînê bi min re hene, dîsan jî ez nedighame wê baweriyê, ku heme. Her û her dem henekê xwe bi min dike û dibêje:*

- *Tu tuneyî, tu ne tu tiştî!*

*Gelo ma kê tunebûn çêkir? Ew kî bû yê, ku di rivê demê de rabû û got, „Tu heye û tu tuneye"? Herdem hebûnê ez di dergûşa bêçariyê de dilorandim û bi nazî di guhên min de dixwend:*

- *Eger ez tunebama, tê jî tuneba, jiber ku hebûna min li ser pişta taliya te tê destpêkirin.*

*Derdorî min tevde heste, hebûne, jiyane, cegere û hêze. Ez li xwe dizîvirim, ku jihevketî me. Ez ketime pêxila qedereke çewt û genî, li hêviya hin hovan, ku bîr bibin bê ez çiqasî belengazim, bi nexweşî û derdên min hest bibin, lê ...!?*

*Di destpêka demê de, gava ku her tişt bi destan ava dibû û şehrstanî ya min mirovanî bû, hingî hebûnê pesnê min dida. Dema ku Xwedê hez kir, malek wî li ser rûyê erdê hebe, hingî destên min yên pêşîbûn di avakirina mala Xweda de, li wê tehtebejê. Lê îroj Xweda, hemî mirov û ta bi kevirên malê li min bûne mîna gurên har. Pêxwas û çiqreş li ser serê min bûne şah û padîşah.*

*Bi her pêximberekî re ez diçûme nimêj û rojiyê û Xweda di tu deman de ji min razî nebû ye! Ji bo mizgeft û dêran, ji bo çi cihê pîroz li ser qadê xwîna min herikiye. Di her deman de min gotiye: „Xweda yeke ne dizê û ne zaye, em tevde kolê Xwedane" .*

*Çi kesê ku li ser vê xakê bi pirtûka xweda girt bû hebûn, ji bilî min. Ez ew kesê hovim, ku tu sûde ne ji olê û ne ji êlê girtî.*

*Heger ez xwe bi xwe nekim hebûn, di tu deman de nabim hebûn û ne jî dibim. Ji ber ku di jiyanê de tiştin hene dibêjinê can, ceger, mejî û dil. Dema ev bi min re heben ezê hebim.*

*(Rojhilat di xeftanê te de asê bûye!!*
*Rojava di çepkên te de çêbûye!!*
*Bakur ketiye paş çeperên şevê!!*
*Başûr bûye leheng û hozanê revê!!*
*De rabe bo min bêje:*
*Kîjan darê ji dilê xwe re bikime kerker*
*Kîjan darbestê*
*Ji govenda birçiyan re bikime per*
*Kîjan çiyayî ji hejmartina qamçiyan re*
*Bikime ferheng.)*

*Ehmed Hûseynî.*

## *EZ JI TE HEZDIKIM*

*Bi nazî xwe berdida damarên min û mîna peyalên meyê ez serxweş dibûm. Nazikbûnên jiyanê tev de di dilê min û xwe de dicivandin û em dibûn bendewarên mistek ax, ku me herdwan biciviîne. Li hêviya terh û şitlên evîna xwe, em dibûn du mûm û find. Her yek ji me ji bo yê din xwe dihilîne da yê din ber xwe bibîne.*

*Zivistan li pey Zivistanê, bi gilokên berfê, dilên me hênik dikirin. Min bi şabûn navê wê li ser berfê dinivîsand. Buhar bi xemla xwe yî çeleng û ciwan dihat, dilê min ji xizanîyan re dikir jiyan. Bi ba û baranê re, bi birûsk û tavan re, bi ewrên har re min û wê xwe dida ber mezrîb û şirikên hêviyan. Me xwe bi devdelinga paşerojek ne diyar ve digirt. Me hemî derd û kulên xwe dixistin buxçikên nehatinê.*

*Ji hingivîna nava hezkirinê me bi aramî hewdên sorgulan dibişkuvandin. Li bexçeyên dildarîyê em dibûn pinpinîkin windabûyî. Bi berbanga sibehê re me sirûdên alal û binefşan diyarî bejna rojê dikirin. Bi bêhnên indeko û nefelan re xewnên me hişyar dibûn. Kerwanê şilêr, sunbil û nêrgizan ji diyariyê re dibûn qurban.*

*Havînê xwe disinciraund û ji havîngehên me re dibû rewrewk. Havîn dibû beyaniya deşt û zozana. Payiza reben bi gemiyên temenê xwenî seridî re di mejiyê demê de dibû golên bêrîkirinên qurmiçî. Wê rengê xweyê zêrîn di buxçikên jibîrkirinê de dikirin zengilên bêdengiyê.*

*Dîsan Zivistan dihat û dîsan min bi gilokên berfê re navê wê dinivîsand û di ber re jî min digot:*

- *Dilber ez ji te hezdikim....*

  *Ji te hezdikim..*

*Ji.....*

*Te......*

*Hez.........*

*Di..........*

*Kim.....*



# *ERÊ GULOKA MIN*

*Ji bo Cîhanê!*

*Erê gulokê! Em gihane hev ji bo em ji hev veqetin. Weke birîndarê, ku di şikeftê de bizûre, min bang te dikir. Tu caran ne dikete bala min û ne jî ez pê diramiyam, ku emê bigihên hev da em ji hev veqetin!*

*Di wê berbangê de min û te gunehên xwe bi lehîya ferêt re berdida. Bi fîxan û azarên mêkewê re şeveqa derd û kulên me sîtavên dûrîyê li ser bejna bîranînan duçrisandin. Ew germaya di nav lihêfê de, seqema di nava me de vedimirand û hêvîyên me dibûn hechecîkên baskokirî di deşt û zozanên bêwariya me de. Weke pîzotên di bin tirafê de, xwezî û hêvîyên me, nalîn û hisretên me, fîxan û derdên xwekuj, har dibibûn.*

*Erê gulokê! Ma ee em bûn bi sibehên bi mijê çavkilkirî bûn. Me bi azana dîkan re sûc û gunehên xwe bi kirasê Anahîta ve girêdidan. Me li ser bênderan berxik dan dikirin û bi arava derdên xwe kulîlkên serçilmisî di bexçeyên bêwariyê de, bi omîd dikirin. Bi nîvişk û qeymaxê serê sibehê re, me xurînîya evîna xwe dişkenand.*

*Weke baranê, ku her dilopek wê dibe qurban ji bo rewayê û can bide axê, me jî zevîyên xwe bi ava bendemanê avdidan û em dibûn mezeloqa şevên rojhilatê. Li ser xirbekan em dibûn polik û çavşînkên demên buhurî. Ez û te her û her bi evîna xwe ve diman, wek du bilbilên serxweş, du çavên westyaî ji nerînê, du kildanên bê kil, du evîndarên bê gihiştin, du ewrên bê tav, du xelekên bê dest. Bi firandina refên qitkan re me pirêzea zevîyên bêqidoş diçinî, lê payizeke çewt bi me dilîst.*

*Erê gulokê! Ezê çawa pesnê vê diljarî û dûrîyê ji te re bidim xuyanî? Ez di kolanên bêxwedî re, bê nasname, xwe pêşkêşî windabûnekê dikim. Di navranên nexweşîyên sedsale de xwe dadwerivînim devê demê, lê hêviyên min bê sûde dirin. Parzûnkê belengazîya min di devê efsanan de asê maye û bê ku ez bizanibim dibim tewanbarê beravêtina mişkan!!!*

*Erê gilokê! Heyva me diçû bin ewran. Kerwanê nêrgiz û şilêran ji buxçikên penaberîyê dihatin dizîn û em bê war, bê hêvî, bê gilî û gazin di jiyana jîndar de sermest diman.*



## *CAREKÊ ÇÛ Û NEMA HAT*

*Bi sira bê re hêvîyên xwe daderivandin. Du dilopên girî di çavên wî de asê diman, volkanek di hinavan de dikeliya. Kul û azarên wî di ser dev re diçûn û xewnên revyayî di buxçikên tengayan de xwe qilûs dikirin.*

*Şevê mîna devakî pîr xwe bi ser de berdida û ew di şopên bîranînan de dibû nêçîrvanê xweziyên xwe yên ne diyar. Ne li tu dema û nejî li tu deverê, şopên xwe ji bîr nedikirin. Weke mirî yê ku ji gorê bête vejandin, di nav dehil û baxên evîna xwe de digevizî û bê hempa dibû paşayê dema xwe. Mîna perwaneyeke sergêj di pêxila yara xwe de difirya, xwe bi ser de diçimand, destên wê digirtin, maç dikirin û jê dipirsî:*

- *De ka ji min re bibêje, ey delala derd û kulên min yên bê sînor! Ezê çawa sorgulên nazik di baxê evîna te de av bidim, da ev evîn geştir bibe? De ka bibêje ey xewna min ya bê xew! Çawa ezê bi agirê dûrbîna te nesûtim? Ez dizanim wê ştil û şaxên vê evînê li ber her rêkê şop bidin, wê li ber her avekê kat û zîl bidin û di ber her bayekî re wê bêhin bidin û ezê bibim hozanê çavê teyên ji tirsê westyî. De ka bibêje çima tu wa melûl û xemgînî, tu wa bê his û dengî? Ji bo çi tu li pirsa min xwedî dernakevî?*

*Bi dil geşî berê xwe dida wî û bê ku hestên wî birîn bike, xwe bi destên wî ve digirt û dixwest ku rabe ser xwe. Lê dîsan bi erdê ve dihat xwar û digot:*

- *Ax melûlî, delalyo! Ma qey tu nizanî ku melûlî par û pişka meye? Evînbazî di warê mede qedexey? hêvî û omîdên me di hundirê şikeftan de bizdyaî mane? De ka tu ji min re bibêje, çima kirî evîn ji dilan re qedexkirî be?*

- *Çima wê cihê tewan û mirinê be? Çima kirî ku evîn bazdayî û veşartî be? Çima wê evîn di dilê me de bi tirsê re bê kedîkirin?!*

*Herdû bi ser hev de ditewiyan û şahîya dilûlî kirasê xwe bi ser wan de dikir. Defên sîngên wan bilind dibûn û dadiketen, diçûn û dihatin. Diçûn û dihatn. Carekê çûn ûnema hatin.*



## SERŞOKA GUNEHAN

*Ji bo ye Beşîrê mele bavê Şahîn.*

*Tê bîra te! Wexta ku te ez di birînên xwe de vedşartim û te lerzên min dilorandin.*
*Liser çoga te ez û xewnên xwe yên xilmaşbûyî dibûn du termên bê leqandin û liv û te borîna min di parastegehên dastanî de haş dikirin.*
*Di firehî û pehnîya gerdûnê de, te kulîlkên xwestekên min diseridandin barê koçerîya min li kerwanê bê dengyê siwar ihat.*
*Dengekî ji taristaê ez vedciniqandim:*
*Bi kude kerwano?*
*Lê ti bersivên pûşt serê xwe randikirin.*
*Qurçik û alî min jibîrdikirin, sînor û bumbe sîbolên çibûn, yên çine min nizanîbû.*

*Di gavên şahrstanî de ezim xwedî yê tekel û bi keskesorîya rengîn re dibim xweziyên qurmiçandî. Dibîm kurmikê beravêtina di malzaroka paşerojê de.*

*Tê bîra te! Wexta zayîna derdên me yên qedexkirî li hêviyan diterpilîn surgun û meşextî li hev dibanyan. Bi nêrgizên berîyên me re bêrîvan vala vedgeriyan malên xwe.*

*Tê bîra te! Wexta ku koçên bêwariyê ji bîranînên me re darbestek ji şoqil û pîvongan darvedkirin.*

*Tê bîra te! Wexta ku te ez derbasî serşoka gunehan kirim û bi hevokên pîroz re canê me yê nazik li sûc û gunehên me diqelibî û poşmanî yên me hevdû dixwarin.*

*Mirin...Mirina min ya rojane dibû hêlînkên zarokên bêmirês, her daxwaz doz, lêbuhrîn û derfet ew bû ku ez bijîm.*

*Bes bi tenha vê gotinê...bi......jî........m.*

*Pirsne bê serî dihatin mejiyê bêçarî yê „ Çilo...Çawa hey dek û dolabên behesab“?*

*Hey xwedayê bej û avî yê, bê zanîn, bê hişîn, dibim agirê pîrozbahîyan. Dibim şahsiwarê hespên demên windayî û buhurî.*

*Bi koranî û ne koranî di xefk û davan de wedibim. Dibim sîstemên hevpişkirinê, hevpişkirina xwe ya ku her û her berdewame. Dibim êrîşên qayîş û berberîyê, dibim damar û rehên qirkirinê, qirkirina xwe bi xwe, di dema xwe ya jibîrbûyî di demê de.*

*Tê bîra te, wexta ku te ez di birînên xwe de vedşartim, û te lerzên min dilorandin.*
*Li ser çoga te ez û xewnên xwe yên xilmaş bûyî dibûn du termên bê liqandin û liv, û te borîna min di parastegehên destanî de haş dikirin.*
*Tê bîra te, wexta zayîna derdên qedexkirî li hêvî yên me dibanîyan.*
*Tê bîra te, wexta ku koçên bêwarî yê ji bîranînên me re darbestek ji şoqil û pîvongan darvedkirin.*
*Tê bîra te, wexta ku em derbasî serşoka gunehan dibûn, û bi hevokên pîroz re canê me yê nazik li sûc û gunehan diqelibî, hingî poşmanî yên me hev dixwarin.*

